

Avatar tenê 3 xelat wergirt

» RÜPEL 9



Çand

Stres, pirsgirêka jiyana nûjen e

» RÜPEL 8



Tendûristî

Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.comê / Çapa Dijital / 09.03.2010

Hejmara 6

Rojnameya Kurdî a serbixwe

hawarnet.com / hawar.hk-mg.net/PESKETIN

agahi@hawarnet.com



İsraîl dixwaze hevdîtinên aştiyê ji nû ve destpêbikin

İsraîl dixwaze awayeke bi lez bi Filistinîyan ra pêvajoya guftûgoyê aştiyê nûjen bike. rûpel 6

Erdhêj li Kurdistanê ji xist; 57 mirî

Di erdheja Navçeya Depê ya Elezî (Xarpêt) de, hejmara kesen jiyana xwe ji dest dane derket 57an... rûpel 2

Kurd bi avayekî xûrt tevlî hilbijartinan bûn » r.2

Maç betal bû; Li stada Amedê bi marşa Herne Pêş protesto » r.2

Di 100'emin salvegerê de Coşa jinan gihêst asta herî bilind » r.3

Fetullahçı dê êdi bi zimanê Kurdi êrişî Kurdan bikin » r.2

Erdhêj zêde dibin; Gelo bi rastî qiyamet nêzik dibe?.. rûpela 10



Li Çinê gûherîna sosyal û zayendî . 10

Naveroka Din
» Gotar r.5-6
» Zanist r.8
» Aktuel r.10
» Çand r.8

Dewleta tirk
“çareseriyê” ji bo berjewendiyêñ xwe anî rojevê SERHAD B.RÊNAS » r.5

AKP tenê xwe diparêze... PESKETIN » r.4

Kurdên Xorasanê Dr. Kawa Xorasanî » r.4

Wesanen HKMG:
HAWAR NET: hawarnet.com
MUSIKVÖLÖD: musikvolod.com
SHEVANVÖLÖD: shevanvold.com
ZANISTUTEKNOLOJİ: zanistteknoj.com
KURDO KÜLTÜR: kurdo-kultur.com
ASORINAR: asorinarturkey.net
EZYU: eyzu.net

Kurd bi avayekî xûrt tevlî hilbijartinan bûn

Li Iraqê hilbijartina parlementoyê pêk hat..

AMED (Pêşketin)
Beşdariya Kurdan bo hilbijartinan bi avayekî xûrt pêk hat. Tê hêvî kirin ger Kurd li Kerkükê serkeftinek baş bidest bixin dé çarenivisa kerkükê zelat bir te.

Rêvebiriya kurdistana Federal ser sindoqan bûn
Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzani di bikeyeki dengdanê de li Serê bilind dengê xwe bi kar anî. Piştî

dengdanê serokê Herêma Kurdistanê daxûyaniyek neda.. Serokê hukûmeta herêma Kurdistanê Dr. Berhem Ehmed Salih bi xêzana xwe xanima Serbax re besdari di prosesa dengdanê de kir. Serokê hukûmeta Herêma Kurdistanê li qotabxaneya Şirin ya Kiçan li taxa mamotayan li bajarê Silêmaniye besdari di pirosesa dengdanê de kir. Serokê hukûmeta Herêma Kurdistanê Berhem Ehmed Salih tekezi li ser evê çendê ji kir, ku pesendkirina derencamên hilbijartinan xaleki giringe û pêdivîye di

bareya pesendkirina derencamên hilbijartinan de hemû aliyêna Iraqî bi şewyekî dirist tev bigerin Serokkomarê Iraqê Celal Talebani li binkeyeke dengdanê ya bajarê Silêmaniye dengê xwe da. Talebani, ji çapemeniyê re ragehand ku di pékhâtinâ hukûmeta nû ya Iraqê de hézén nû dê derbikevin. Herwiha li gor Talebani, hilbijartina vê carê nexşeya siyasi ya Iraqê de bi temamî biguhere. Talebani, piştî daxwiyaniya bi çapemeniyê re, wek yeke min dengder, li Dibistana Rewşen



Bedirxan deng da. Talebani got: "Îro rojekê dirokî ye; dîvê hemû kes û ali rîz li encamên hilbijartîne bigrin." Serokê parlyamenta Kurdistanê Dr. Kemal Kerkükî ji li paytexta Herêma Kurdistanê Beşdari di pirosesa hilbijartinan Parlyamenta Iraqê de kir. Listeya Hevpeymaniya Kurdistanê li pêş e. Piştî ku serê vê sibehê tevî herêma Kurdistanê li hemû bajar û bajarokên Iraqê, hilbijartina giştî ya hilbijartina Iraqê dest pê kir, berê kêmeke encama destpêkê li herêma Kurdistanê aşkere bû. Li gor encama destpêkê, li Kerkük, Silêmani û Hewlêre Listeya Hevpeymaniya

Kurdistanê bê rêjeyeke berçav li pêş listeyê din e. Listeya hevpeymaniya Kurdistan LHK'ê liemberi nebûna navê nezî 65 hezar dengderen herêma Kurdistan û deveren cudabûyi nerazibûna xwe nişna da û li ser vê mijare nameyeke nerazibûne ji Komisyonâ Bilind ya Serbixwe ya Hilbijartinan re şand. Nêziki 19 milyon kesan mafê dengdanê hebû û bêtir 6000 kandin yan berbijar pişkdariya hilbijartinan kir jîbo perlemana 325 kursî.. HAWAR NET.com

Pevçûna YNK û Goranê di roja dawî de jî dewam kir

Di pevçûneke navbera aligirê listeyen başdari hilbijartinan de li Şarezûyê, 7 kes birindar bûn.

Rêveberê Giştî yê Saxlemiya Silemani Rêkew Heme Emin j diyar kir, "Hejmara birindarê büyera şeri li bajarê Şarezûyê gihiştiye 7 kesan". Heme Emin got, "Niha rewşa saxlemiya birindaran normal e". Pêştir Peyvdarê Tevgera Goran Tofiq gotibû, "Roja inê hejmarek çekdarê YNK érişî aligirê Tevgera Goran yén bajarê Şarezûyê kirine û di şer û pevçûneke navbera her du aliyan de hejmarek welati birindar bûne". AJAN SAN

Li bakûrê Kurdistanê cosa Newrozê destpêkir

AMED (Pêşketin)
Gelê Kurd di li çar aliyê Kurdistanê û Cihanê dest bi amadeakarı û pirozbahiyêne cejna neteweyîya milletê Kurd, Newroz ê kirin. Ji aliyê kurdên dervey welêt ve piroz kirina Newrozê destpêkir. Li gelemeperiya Kurdistanê di cosa Newroza 2010'an gestir dibe. Hevseroka Partiya Aşti û Demokrasiyê (BDP) Gultân Kişanak, serokê herêma Kurdistanê Mesûd Barzani ú serokkomarê

Iraqê Celal Talabani vewxandin Newroza isal ya Amedê. Kişanak di hevpeyvineke digel Kovara Warvinê de got: "Em ê bi hatina birêz Mesûd Barzani û Celal Talabani bo Newroza isal ya Amedê serbilind û rûmetdar bin." Hevseroka BDP'ê Gultân Kişanak di hevpeyvina xwe ya digel kovara Warvinê de li ser tekiliyê di navbera hikûmeta Kurdistanê û

Tirkîyeyê, konferansa kurd, érişen li ser BDP'ê, rîliberveyekirina kurd de, fikir û ramanen xwe anîye ziman. Wek tê zanîn Amed ku 'paytexta' Newrozê ye. Newroza Amedê ku çav li rî ye, isal weki salén rabirdû bi sedhezaran kes li hev kom bibe û bi heycena hilbijartîn coş ji zêde be. Li bajarên bakûrê Kurdistanê bernameyên piroz kirina Newrozê ji di nava vê hefeyê de dê hêdi hêdi diyar bin. AJAN SAN



Maç betal bû; Li stada Amedê bi marşa Herne Pêş protesto



Hefteya 24'ê ya Super Lîga Tirkîyeyê de, li Diyarbekirê çavê her kesê lê maça digel Bursassporê bû. Lê dema li beriya maçê bûyer derketin. Maç hate betal kirin.

Bursassporê bû. Lê dema li beriya maçê bûyer derketin. Maç hate betal kirin.

D.bakispor û Bursasporê de alozi derket.

Aligirê Diyarbakirsporê neheqiyê ku li Bûrsayê hatibûn kirin protesto kirin. Li ser midaxelya polisan pevçûn derket. Bi derketina pevçûn hekemîn maçê bi aveyeke lîzûbêz maçê betal kirin.

Rêvebirê D. Bakir sporê dijî bîyaryê deketin û gotin hekem bi qasti bîyaryaeke wisa dignin

pevçûn wê zêde dewam nekiriba. Weki tê zanîn, maça ewil li Bursayê hatibû leyistin. Di wê maçê de terefdarên Bursasporê bi sloganên, "PKK bila biçe der" érişî terefdarên Diyarbekirsporê kiribûn û bûyeren nexwê rûdabûn. Rovanşâ wê maçê li Diyarbekirê bû. Pevçûna li ber stadê û revîna lîstikvanê Bursasporê di medyaya Tirkî de bû mijara yekemin. HAWAR NET.com

Erdhêj li Kurdistanê jî xist; 57 mirîn

Di erdheja Navçeya Depê ya Eleziz (Xarpêt) de, hejmara kesen jiyana xwe ji dest dane derket 57an..

AMED (Pêşketin)

Di çarçoveya sewkiyeta leşkeri de hate zanîn ku heta niha 4 hezar û 500 leşker ji bo navçeya Lice ya ser bi Amed hatine şandin. Bi nezîkbûna mehîn biharê re tevgera leşkeri zêdetir bû. Hate diyarkirin ku di encama wê tevgera leşkeri ev sere hefteyekê ye dom dike de, bi otobusan leşker ber bi navçeyê

hefteyekê ye dom dike de, bi otobusan leşker ber bi navçeyê de hatine şandin. Leşker di qereqolên gund û bajarokan de têne bi cikirin.

Di hînek qereqolên li gundan de ji, hînek hézén taybet hatine bi ci kirin. Ev hêz bi helikopteran li herêmê hatine danin.

Li bajarên wek Diyarbekir, Batman, Bingol, Meleti û Erzinacê ji bandora paşerdhêjan dewam dike û xelkê tenegezardike.

Hevserokê Partiya Aşti û Demokrasiyê (BDP) Selahattin Demirtaş, daxuyand ku BDP digel hemû şaredariyê xwe dê alikariya gelé Elezize bike. HAWAR NET.com

Kurd bi bîryara derbarê Helebçeyê kîfxweş in

Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêşwaziya bîryara Dadgeha Bilind a Tawanîna ya Iraqê derbarê bi tavkuji nasina kimyabarana Helebçeyî, kir

HEWLÉR (Pêşketin)

Berdevkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Kawe Mêhmûd ji AKnews'e diyar kir, "Bîryara Dadgeha Bilind beşike li wan hewlane ku hikûmet, Wezareta Karûbarê Şehid û Enfalkirîyan, Wezareta Dadê û tîma parêzêrên vê dosyeyê kirine".

Mehmûd wiha pê de çû,

"Hikûmeta Herêma Kurdistanê vê bîryara Dadgeha Bilind ji akinciyan bajarê Helebçeyê û malbata şehidan piroz dike".

Tevkuijîya Helebçeyê hate nasîn

Dadgeha Pêdaçûnê ya Iraqê tawana kimyabarana Helebçeyê

bi tevkuji da zanîn. Dadgeha Bilind a Tawanîna kimyabarina Helebçeyê di çarçoveya madeya 12'an ya hejmar 10'ê ya sala 2005'an bi diji mirovayetiyê dabû zanîn û niha ji li ser daxwaza Desteya Berevanikirina li qurbanîyê Helebçeyê bi tevkuji nas kir. AJAN SAN

Fetullahçi dê êdî bi zimanê Kurdi êrisî Kurdan bikin

Cemaata Gulen bi riya medyayê érişen hemberi Kurdan fit dike. niha xwe amade dikin ku bi riya DUNYA TV bi zimanê Kurdi êrisî Kurdan bikin..

AMED (Pêşketin):
Televizyonâ Samanyolu TV (STV) û rojnameya Zaman, kovara Aksiyon, kovara Sizinti û gellek weşanên din û bi hin weşanên herêmi ji idolojiya Fettullahçîyan de weşan dikin.

Fettullahçi bi taybeti sistema perwerdeyê bi dest xistine û piştî bûyera 28 sibata Tirkîyê bo legal bû û pêşketinê vê qadê ji xwe re weki bingeh girtine ji dersxane û dibistanen taybeti bigrin, kovarén zanisti pirtukén bo amadekariya ûniversite ji aliyê

wan tê weşandin. Her wiha di demeke nêzik de wê cemata Fettullahçîyan bi riya DUNYA TV bi zimanê Kurdi êrisî Kurdan bikin. DUNYA TV ku navenda wê li Entebê de ye di demekê nêzik de dest bi weşanê dike. HAWAR NET.com

Artêşa dagirker a dewleta tirk sewqiyata leşkerî dike...

Di çarçoveya sewkiyeta leşkeri de hate zanîn ku heta niha 4 hezar û 500 leşker ji bo navçeya Lice ya ser bi Amed hatine şandin. Bi nezîkbûna mehîn biharê re tevgera leşkeri zêdetir bû. Hate diyarkirin ku di encama wê tevgera leşkeri ev sere hefteyekê ye dom dike de, bi otobusan leşker ber bi navçeyê de hatine şandin. Leşker di qereqolên gund û bajarokan de têne bi cikirin.

Kurd bi hêrseke mezin bêedeletiya Ewrûpayê şermezar dikan

D.BEKIR (Pêşketin)

Bi hezaran kes bi armanca protestokirina biserdegirtina sazi û dezgehén kurd û desteserkirina siyasetmedarê kurd, li paytexta Belçikayê Brûksele kom bûn û bi drûşma "Roj Tv ne bê xwedi ye" meşyan. Li Paytextê Belçikayê li Brûkselê li dora 8 hezar Kurd ji ber lisergirtina Roj Tv û girtina

siyasetmedarên Kurd çalakiyan derbaz dikan. Roja 4'ê Adarê polisê Belçikayê di studyoyen Roj Tv'ye légerin derbazkirin û her weha hinék siyasetmedarên Kurd bincav kirin. Di nav wan da endamén Kongra Gel Zubeyir Aydar û Remzi kartal ji hene. Partiya Karkeren Kurdistanê bang li hemû Kurdén li Ewropayê dijin kir, ku li hember operasyonê dewleta Belçikayê çalakiyan pêkbinin û wan protesto bikin.



Bi hezaran Kurd li Ewrûpayê dakin kolnan û terora Ewrûpayê şermezar kirin

Li Hewlêrê érişa li dijî Roj TV hate şermezarkirin

Sermezarkirina érişa polisén Belçika ya li dijî Roj TV zêde dibe. Li Herêma Federal a Kurdistanê, çampeniye érişa li dijî Roj TV şermezarkir. Serokê Sendikaya Rojnamegeren Kurdistanê Ferhad Awni, bi daxwiniyekê érişa li dijî Roj TV'ye şermezarkir.

Berpîrsê Biroya Hewlîrê yê Peyam TV'ye Mihemed Acicelal ji érişa li dijî stutoya Roj TV şermezarkir. Acicelal, diyar kir ku ev érişé érişe li dijî çapmeniya Azad û wiha got: "Em wek Payam TV'ye érişa ku ji aliyê polisê Belçika a li dijî Roj tv û MMC û çapmeniya azad pêk hatiye şermezarkir. Ev yek li dijî exlaqê azadiya ramanê ye. Ev éris li welatek pêk tê ku ji xwera dibêje ez welatek demokratim, ev ériş nayê qebûlkirin." Berpîrsê Radyo û Telfizyon Zehmetkêşan Armanc Ali ku radyo û televizyon yê wan li nava bajêrê Hewlêrê weşanê dike érişa li dijî stodyuya Roj TV mehkum kir.

Meş, li Qada İstasyona Nord saet di 13:00 de dest pê kir û bi hezaran kes besdarê çalakiye bûn. Çapmeniya navneteweyi û ya Belçikayê eleqekeye mezin nişanê çalakiye dan. Ciwanen ku ji herêma Limburg a Belçikayê tevli bûbûn, pankarta "Belçika, nebe listokê DYAYê" vekirin. Pîstî meşê mitingek hat lidarxistin û Serokê KNK'ê Tahir Kemalizade axaftineke tûj kir û Belçikayê û Yekitiya Ewropayê hişyar kir. Xebatkara Roj Tv'ye Necibe Karadaxji ji axaftinek kir û wiha got: "Ji me re dibêjîn terorist, lê yên ve érişé

kirine terorist in, em dengê geleki ne." Siyasetmedare kurd Cuma Tak ji di axaftina xwe de diyar kir ku ev konsepta li dijî gelê kurd. Parlamentera Mêrdinê ya BDP'ê Emine Ayna ji beşdarê çalakiye bû, axaftineke kin kir û silav li berxwedana çalakvanan kir.

Li bakûrê Kurdistanê di gellek bajaran de protesto

Bêhiqûqiya Ewrûpayê li bakûrê Kurdistanê ji hate şermezar kirin. Rêxistinê BDP'ê yén Sert û Mersin, Wan, Riha û Edeneyê serdagirtina Roj TV'ı û girtina siyasetmedarên kurd ên li Ewropayê şermezar kirin.

HAWAR NET.com

zimanê Kurdi bidin û xebatên navxwe ji bi zimanê Kurdi bikin.

- Xebatkarê hemû şaredariyên Kurd divê bi gel re bi zimanê Kurdi biaxiffin. - Hemû şaredariyên Kurd divê di malperên şaredariyên xwe de beşa zimanê Kurdi vekin.

- Hemû şaredariyên Kurd divê di bultenên xwe de li gel Tirkî heri kêm %50 ji zimanê Kurdi bikarbinin. Bêguman zêdetir xal dikare bê réz kirin. Lé ji bo dema niha xâlen li jor ji bêne pêkanin wê téri bike. DERBARÊ MIJARÊ DE ZEDETIR NÜÇE DI www.hawarnet.com DE



Demîrtaş Ewrûpayê hişyar kir: Hişê xwe bidin serê xwe

Hevserokê BDP'ê Selahattin Demîrtaş, di 1'emin Kongreya Awarte ya Rêxistina Bajarê Stenbolê de axivi û érişa li dijî Roj TV'ye şermezarkir. Demîrtaş, diyar kir ku bi operasyona Belçikayê ya li dijî Roj TV'ye siyasetmedarên kurd hewldana AKP'ê zelaltir bû û wiha got: "Neheqiyê li gelê kurd dikan. Navê vê yekê ne çareseri ye. Ev yek tasfiye ye. Gel êdi nayê listikê. Ger ku hûn naxwazin gelê kurd binin hemberi xwe wê demê hişê xwe bidin serê xwe..

Serokê PJAK'ê ji hate girtin

Terora Ewrûpayê ser rexistin û saziyên Kurd berfirehtir dibe

Serokê PJAK-ê, Heci Ehmedi li Elmania hate binçavkirin. Pîstî girtina Remzi Kartal û Zubeyir Aydar li Belçika, polisén Elmania li Kolnê ew girtin. Li gor nûcyea ANF'ye berpirsek yê PJAK-ê ragihand ku; "Em bawer dikin ku di van operasyonan de tiliya Amerika heye. Her cîqas di navbera Emerika û Iranê nakoki hebin ji, hinék agahdari digihin me ku, Emerika û Iranê li hev kirine. Heftiya bûrî serokê Cubdullah teslimê Iranê hate kirin, ev ji listiket ya Amerikayê bû. Amerika dixwaze bi vê helwesta xwe mesajeki bide Iranê. PJAK diyar kir ku navend operasyonan Elmania ye.

Kartal û Aydar hatin girtin

Li Belçikayê ji hêla polisan ve serdagirtina gelek cihen ku nûnertiya BDP'ê û Roj TV ji di nav de bûn hatibû kirin û 22 kes hatibû binçavkirin. Hate ragihandin ku ji wan 22 kesan Remzi Kartal û Zubeyir Aydar ji di nav de 8 kes ji hêla dozgeriyê ve hatin girtin.

Li gor nûcyea ANF'ye, 8 kesen ku li Brûkselê hatibûn binçavkirin û Serokê Kongra Gel Remzi Kartal û Zubeyir Aydar ji di nav de bûn û bo dirêjkirina dema binçavkirin ew hinartin dadwerê lepirsinê. Dadwerê lepirsinê De Coster derbarê 8 kesan de biryara girtinê da. Li bajarê Charlero ji 4 kes hinartin dadwerê lepirsinê û li wir 3 kes serbest hatin berdan û dema binçavkirina kesek hate dirêjkirin. Polisê Belçikayê duhi bi awayek hevdem li ser Kongreya Neteweya Kurdistanê (KNK) û Roj TV û hin deveren ditir operasyon pêk anî bû û dest danibûn ser geleb belgeyan û ketin û derketina binaya Roj TV'ye hatibû astengkirin.

Hemberi PKK'ê çend roj berê li Italya û Fransayê ji operasyon hatibûn kirin. Karbîdesten Fransi eıkere kirin ku, 9 kesen ku bi pêwendidariya PKK'ê hatine girtin wê ji "sûcûn terorê" bêne darizandin. Ji bo dewama nûcye HAWAR NET.com

Di 100'emîn salvegerê de Coşa jinan gihêşt asta herî bilind



AMED (Pêşketin)

Li bajarê Kurdistanê û metropolan ji bo 8'ê Adarê jinan daxwazén xwe bi dirûşman anîn ziman. Jinan got, divê tezez şer zexten li ser kurdan bêne sekinandin.

8'ê Adarê roja jinê nedîk yê cihanê, li bakûrê Kurdistanê ji aliyê jinê kurd ve ji hate pirozkirin. Pirozbahîyên ku heftike berê destpêkiribû bi dawi bûn.

Bi mebesta "8'ê Adarê Roja Jinê Nedîk ya Cihanê" li Amedê mitingek hat lidarxistin. Di mitinga ku ji aliyê Tevgera Jina Azad ve hatibû amadekirin de daxwaza çareserkirina pirsgirêka kurd hat kirin. Mitinga "8'ê Adarê Roja Jinê Nedîk ya Cihanê", bi besdariya bi hezaran jin ku bi kinc û libasen kurdî hatibûn, li meydana ïstesyonê ya li Amedê hat lidarxistin.

Li Diyarbekirê bi hezaran jin hatinba hev û ji bo roja jinan 3 kilometre meşyan. Jin bi kincen kurdewar ên gelêri tevli meşê bûn. Di meş û mitingê de bûyereke yekemîn pêk hat; transekswelên kurd ji bi pankaretk kurdi tevli mitingê bûn. Her wiha li gellek welatên cihanê Roja Navnetewi ya Jinan hat piroz kirin.

Li Komeleya ÇIRA çalekiyên 8ê Adarê

Bi mebesta "8'ê Adarê Roja Jinê Nedîk ya Cihanê", li Komeleya Çandî Hunerê ya ÇIRA ya Amedê, ji aliyê jinan ve çaleki hatin lidarxistin. Gelek kes besdarê bernamê bûn û di nav çoşek mezin de vê roja teybet hat pirozkirin.

Di destpêka bernameyê de li ser girîngîya "8'ê Adarê Roja Jinê Nedîk ya Cihanê" hat rawestandin û herweha bal hat kişandin li ser kesayeti û tekoşina jinê ku di dirokê de di vî warê de li hemberê zilm û zordariyê seri hildane û di vî warê de jiyana xwe dest dane. Di berdewamiya bernameyê de ji bona wan kesayetiye bi vî rengi slaytek hat nişandan. Herweha, di slaytek de jiyana jinê ku di nav tekoşina neteweyi ya Kurd de cih girtine, ji hat nişandan.

Gul û Demîrtaş hatin cem hev

Serokomarê Tirk bi Demîrtaş û Bahçeli re hevditin pêk anî. Serokomarê Tirkîye Abdullah Gul, Pêswaziya serokê BDP-ê Selahattin Demîrtaş kir û derbarê qîza dadgeriyê û ser gûhertina destûrê axifin..

Li Şemzînanê teqîn: Leşkerek mir û 3 leşker ji birîndar

Li çoltara Bajaroka Rûbarokê ya Navçeya Şemzînanê teqîn pêk hat. Di teqînê de leşkerek mir û 3 leşker ji birîndar bûn.



HAWAR NET / NÜÇE Û AGAHÎ

TU LI KÚ BÌ, NÜÇE LI WÈ DERÊ YE

Salvegera Raperîna mezin; 19 salan de perçeyek azade

Ji Raperîna di sala 1991'an a gelê Başûrê Kurdistanê 19 sal derbas bû

PÊŞKETIN

Giringiya wan rojên dirokî bi deskeftiyen iro hineke din tê fam kîrin û gelê Kurdistanê salvegera 19'emin a Raperîne piroz dîkin.

Pêvajoya Raperîna mezin ya başûrê Kurdistanê

Weki tê zanin 16 Adara sala 1988an de rejîma Iraqê bombeyen kîmtewi avêt ser Helebçeyê. Encamé de 5000 Kurd hate kuştin. Lê raya giştîyê Cihanê vê bûyare mezin netidin. Heta di Medyaya Cihanê de piştî 3-4 rojan ev nûcê derket. Ji ber ku Sedam Hisayîn bi sawa yanî gîhiştibû vê hêzê. Piştî vê érişê bi sedhezarîn Kurd ji tîrsâ çekîn kimyewi ji başûrê Kurdistanê rewiyan. Bi hezeran Kurd ber bi bakurê Kurdistanê û bi hezeran Kurd ji ber bi rojhîlatê Kurdistanê cûn. Vê demede ji piştî vê demê ji Neteweyen Yekbûyi meseleya Kurdistan neanîn rojeve. Ji ber ku patronen NY Amerika

Britanya û Rûsyâ tişteki wisa nedixwestin. Piştî dagirikirina Kuveytê ji aliyê Iraqê ve Emerika erîs bir ser Iraqê û Kurd ji vê demê de piştigiri dan Emerikayê lê piştî vekîsına Emerikayê li Iraqê Kurd û Saddam disa hember hew man. Kurd di vê demê de dest bi serhîdaneke mezin kîrin û ev shîhdana Raperîn(vejin)ê bû. • 5'ê Adarê 1991'an de Raperîna mezin destpêkir
• 7'ê Adarê de bajarê Sîlêmanî
• 10'ê Adarê de Rewandiz, Xelîfan, Herîr, Diyanâ, Dûz, Qoysencax
• 11'ê Adarê de Hewlêr û Xaneqîn
• 12'ê Adarê de Mexmûr û Pîrdê
• 13'ê Adarê de Akrê, Zaxo û Berdareş
• 14'ê Adarê de ji Dihok û Amêdi
Ji alîya gel ve bi delfetén xwe ji destê rejîma Iraqê rîzgar kîrin. Lî belê Emerika xiyaneti kir li Kurdan kir û alîkariya Kurdan nekir. Lî bi xêra hin qenâlén Medyaya Cihanê rayagîstiya Cihanê li hemberê hovitîyên Saddam û bêbextiya Dewleta Emerikayê rabûn ser lingan. Li ser vê yekê ji hin dewletén Ewrûpa -di seri de britanya- mecbûr man ku bo parastina Gelê Kurd hin

careyan gerîyan. Heta 15 Nisanê hejmara Kurdênu ku reviyabûn Iranê ji milyonek zedetir bû. Pîrsa Kurdistanê bi hefteyan ji rojeva Cihanê dernek. Dawiyê de George Bush mecbur ma ku Iraqê hişyar bike. Disa ji Kurd baweriya xwe bi gotinîn emerika nedianin. Her çiqas George Bush hewlî dîda ku zexten Ewrûpa, çapameni û raya giştîya Cihanê rîzgar bibe ji li hemberê rexne û bêbextiya ku Kurdan kiribû neçar man ku ji bo bi Britanya, Elmanya, İtalya, Frensa di 16'ê Nisanê 1991'an de xeta 36'ê û jor de bo gelê Kurd herêma azad ilan kîrin. Lî bajarên wek Kerkükê ku neft lê hebû nedan Kurdan. Kurd bi demekî kin de vegerin ser xakén xwe û demekî kurt de hêzên xwe ji nû ve qezenc kîrin û êdi bênavber dixebeitin. Piştî demekî Kurd dest bi xebatêna avakirina Kurdistanê kîrin da ku vê delfeta dirokî û bêhempa bikarbinin û 19 Gulana 1992an de Li Basurê Kurdistanê yekem hilbirtinîn giştî yên Parlementoya Kurdistanê pêk

hat. Ji bo parlemen Kurdistan 6 liste besdari hilbijartînê bûn: 1- Partiya Demokrata Kurdistanê, 2- Yekitiya Niştimanê Kurdistan-Partiya Zehmetkêşen Kurdistan, 3- Partiya Sosyalisti Kurdistan-Partiya Demokratî Serxwebûni Kurdistan, 4- Partiya Demokratik a Gelê Kurdistan, 5- Partiya Kominis, 6- Tevgera İslamiya Kurdistanê. Ji ber ku hilbijartînan de %7 beraj hebû tenê du liste; listeya PDK û listeya YNK-PZK ketin parlementoya Kurdistanê. Listeya PDK ji% 45.26, listeya YNK ji% 43.82 dengan girtibûn. PDK û YNK li hev kîrin ku 100 kursiyan di navbera xwe de 50-50 parve bikin navê vê sistemê re fifty-fifty dihat gotin. Lî ev sistem de pêşerjêde bû lihevnatînên mezin. Hilbijartîn tevi hemû kîmasiyêñ xwe him hîviya gelê Kurd zêde kîr, him ji nişanî hemû Cihanê dan ku ji bo pêşeyünê zemineke baş heye. 46 Heziranê de Parlementoya Kurdistanê vebû û parlementaran sond xwarin. Parlementoya Hikumeta Kurdistanê bi tempoyeke baş dest bi karén xwe kîrin. Pêşeyünê ku li başûrê Kurdistanê dibû ne tenê bo Kurdistanîn Başur bo hemû Kurdistanîyan dibûn tovên hîviyên nû. Di 4ê Cotmeha 1992an de Parlementa Neteweyîya Kurdistan bîr yerek dirokî vergirt û "Dewleta Federe ya Kurdistan" ilan kîr. Yekem serokê parlemen Kurdistanê Cewher Namiq bû.

Berhemîn raperinê Kurd iro piştî 16 salan ji Raperîne ne serbixwe be ji ú beramîbi hemû kîmasi ú xeletiyan dewletek avakirin, bi dehan organen media, Hikumeta Kurdistan, Parlemen Kurdistan, wezaretên Hikumeta Kurdistan, bi dehan sazi, dezgeh, résistînê neteweyî (çandi, siyasi, perwerdeyî û fermi) afirandin. Emro beşekî ji xaka Kurdistan azad û ber bi serbixwe bûyîne we diçê. Parastina Kurdistan Azadango Kurdistan hemû Kurdistan, bégûman erka bingehin û neteweyî ye.

Dijberen Kurdistan li pêy tekdena wan destketiyane

Di serî de dewleta Tirk û dewleten yê dagirker Iran û Sûriye û hemû dijberen Kurdistan li pêy tekdena serketina Kurdistan a li Kerkükê û bi giştî Dewleta Federe ya Kurdistanê ne. Tirkîye di nav vê 16 salen de her tim xwest ku Dewleta Federe ya Kurdistanê-bâşûr têk bibe. Ji bo pêkanina vê armance ji bi taybetî arteşa Tirk û hêzen tarî li pêy planen qirêj de ne û érişî Kurdistan Azad kîrin û têkçûn ji axa azad reviyan. Lî ji dev ji pêkanina aramanen xwe hê ji bernedane.

Pêwiste Kurd nezi hev bibin û stratejiyek neteweyî, mayinde û pêşketi pêkbinin. Divê hemû gelê Kurd bi yekrezi tevbigirin da ku planen Tîrkan pûc were derxistin. Di salen dawi de weki hemû karesat û érişen mezin Kurdan nezi hevûdin kîr. Di vê pêvajoyê de ji Kurd divê neziki hev bibin û hismendîya Kurdeyati bilind bikin.

Kurdê Xorasanê

Dr. Kawa Xorasanî

Kurd ko ji qomêne hind û evrûpâyene, ji lêkolin û kûzêne kevin-nasîyê hatîye bêli kîrin ko Kurd xwedîyê temedoneke mezin bûne û nîzik li 7000 sal beri niha li welat û çiye û bilinde mizopotamiyayê dîjbûne. Li destpêkirina sedsa 16an mîletê Kurd li navbeyna imparatûriya Osmanî û Iranê ya Şah Sefevî bûne. Zevî û xaka kurdan bûye dixweziya her du imparatûran. Sera çaldiranê li sala 1514ane zayinê çebûye ko Osmanîyan şikeşt dane Sefevîyan û Kurdistan bûye du sezan. Parek cû ser imparatûriya Osmanî û parek ji cû ser imparatûriya Iranê. Xorasan ko ji paytexta Sefevîyan zor dûr bû, Ebdol-momin-xanê Ozbeki li érişâ xweye çekdari bi Xorasanê, pêşrevî kîriye û ta nîzikê Damqanê û Simnanê pêşveçûbûye. Li pêşreviye xwe, şehr û gond û déhat vêyran dikirine û gelek mirov ji hatine koştin. Şah Ebas sefeyî li

gori felsefa Ibn-i-Emid ko gotibû tim pêwiste ko Kurdan bikene siperâ belê, kete fikira şandina Kurdistan bi welayeta Xorasanê li bakûra rojhilata Iranê. Balam Şah Ebas bi şandina Kurdan bi Xorasanê, bi tirek du nişan lêdixistin: 1- weziyeta xwe li rojhilata Iranê cedîkir û pişîya hemîn ecnebiyan û Ozbekan digirt.
2- Kurd ji ji hevdo vedigetandin û kêmîhêz dikirin, hîngi piştre pişîya serhîldan û şer-hîshiya Kurdan digirt ko ji bo wi re moşkileke heri mezin bûye li rojaveyaya Iranê.
Li her du haletan, yenî ci pîrûz bûyina Kurdan, yan ji şikeşt xwerin û nabûdiya Kurdan li Xorasanê, Şah Sefevî fayde dîbir. Siyaseta şah sefeyî karê xwe kîriye û welatê Iranê bi destê érişgeran parce nebûye, balam welatê kurdan bîxwe hate parçekirin û mîletê Kurd hate pîjîgandîn û ma li bin desten hakim u qasibêne zalim. Ji îl eşîrên Kurd, hînek şandine Xorasanê, ko li zemana silsila

padişahiya Sefevî li sala 1590an ya zayinê (Milâdi) bûye. Sebeba wê şandinê ji were ko hate gotin bi rasti siyasi bûye. Kurd hatine şandin ko li dijî hemlîn Ozbekan û Mogolan bisekin. Kurdan li Xorasanê şikesteke zor sext dane érişgeran û ew vegerandine şuna xweyi berê.
Li rekoçan hînek ji koçberan ji bo sebebên jûr-vejûr mabûne, ko hin ji li wan deran dîjine, mina şehrén: Rûdbar, Takistan, Veramin, Demavend, Firuzkoh, nûr, kelardeş. Balam tayfîn wan ji mina: Kakavend, Amarlu, Şamlu, Kelhur, Umeranlu ne. Şah Ebas ko ji jamêri û zora Kurdan gelekkirin, xwest ko herwiha yêkitiya Kurdan xirab bike û wan ji hevdu bipiçiqine ta hikûmeta xwe berdewam bike. Li hidûda sala 1590an ya zayinê nîzik li 5000 malbatên Kurd bûne koçber û ji aliye rojavayı Iranê rû bi aliye Xorasanê (bakûra rojhilata Iranê) ketine rî. Nîzik li sé salan kişand ta ko bigijine

Xorasanê, balam ji 5000 malbatên koçber nîzik li 4500 gihiştine Xorasanê û yên din ji li bay rekoçan man û herd bi herd jîh girtin. Şah İsmail Sefevî Kurdêna tayfî qeremanlu bi serokiya Beram Begê Qeramanî li dijî Ozbekan li Xorasanê serast kîriye. Lawî şah İsmail yeni şah Temâşb ji Kurdêna tayfîn Zengene, Çigini û Kelhor koçandine Xorasanê, bo alikariya Beram Begê Qeramanî. Li sala 1595an ya zayinê li menteqa Cacermeye Xorasanê serekî mezin li navbeyna Ferhad-xanê Qeramanî û Ebdol-momin-xanê Ozbekan bi rî ketiye ko Ozbekan şikeşt xwarine û Kurdan ji hey pisrevî kîrine ta ko Ozbek ji herêma Xorasanê dane derxistin. Kurdêna Xorasanê li navbeyna 2 ile mezin jîh digirin.

Her il ji ji gelek tayfan cé dibûye. Her du ilen Xorasanê vinane: 1- Zeferanlu 2- Sadlu • İlê Sadlu ji 13 tayfîn xwe heye. Alan, Dirgan, Garivan, Gurdan, Înran, Jaban, Juyan, Kaqan, Miran, Qiliçan, Qerabaslu, Qupran, Qereçarlu, Zendîyan, Kurdêna Xorasanê piranîye wan mosilmanen. Şehrén Kurdan li Xorasanê mina: Quçan, Bojnûrd, Esferayen, Sirvan, Çinaran, Deregez, Kelat, Aşxane, Faroj, Bacigiran, Mane û Similqan. Piranîye Kurdan li gondene Xorasanê bi zeraetkari û pêz û maldarî misqûlin. Jiyana koçberiyê û yêlaq-qêslaq kîrin ji hin li navbeyna wan didomêye. Çiyêne yêlaq kîrina Kurdêna koçber li Xorasanê mina çiye

HÊZAXÊZ



ARTEŞA TÎRK Ü MEDYAYA TÎRKÎ

Serê desthilatdariyê didome; AKP tenê xwe diparêze...

PÊŞKETIN

Li Tîrkiyeyê, Serokomar Abdullah Gul ji bo pêşketinê piştî "Operasyona Balyozê" bi Serokwezir Recep Tayyip Erdogan û Serfermandarê Gîsti İlker Başbuğ re rûnişt. Hevditinê ku rojîn pêşembi bi awayekî asayı pêk dihatin, iro, bi tevlîbûna Güll, Erdogan û Başbuğ wek zirveya séali pêk hat. Piştî zirveyê de malpera Serokomariyê de hate daxuyandin ku wan baştır ditiye ku vê civinê bi Serokwezir Recep Tayyip Erdogan û Serfermandarê Gîsti İlker Başbuğ re li dar bixin. Di daxuyaniyê de hate bibirxistin ku di hevditinê de mijaren di rojêve de bi berfirehi hatine nîrxandin û wiha hate gotin: "Bila gelê me baş bizanibe ku ev pîrgîrîk dê di çarçoveya makezagônê de bêne çarserkirin û bila her kes di vî wari de bi berpîrsyari tevbîgire. Erdogan li Parlamentoa Tîrkiyê (PT) derbarê hevditinê de gotiye, "Hevditin gelek baş derbas bû." Hejmara subayen hatine girtin, derket 20'an. Degnvedana 'Plana Darbeya Balyozê' li Tîrkiyê dewam dike. Doh ji 20 subayen birin adliyê, 7 jê wezifedar bi giştî 13 kes hatin girtin. Bi vi awayi, hejmara subayen ji pêr ve hatine girtin, derket 20'an. Di çarçoveya 'Plana Darbeya Balyozê' de Koramîr Feyyaz Öğütçü, 7 ji wan subayen wezifedar, 20 kes heta derenegiye rojîfîade dan dadgehê. Di encame de, 10. Dadgeha Cezayî Giran ya Stenbolê ji ber 'Bi hewldana hilweşîndina Hukumeta Komara Tîrkiyê û endamtiya résistîna terorê bîyara girtina 13 subayan da.

AKP bo berdewamiya desthilatdariya xwe dest bi operasyonê kîr

Piştî li dijî AKP doza girtinê hate vekirin û derdorêne militarist û şoven AKP xistin tengasîyê û imaja AKP xirab kîrin, niha AKP ji nû bi dest xistina héza û bo çavtîsandina wan dersoran hin beşen çeteyâ Ergenekon deşifre kîr. Lê wisa xuyaye ku AKP vê çeteyê bi temami ji holê raneke û dewleta kûr a Tîrk û çeteyên bi rengi her hebin. Jixwe AKP guhertina helwesta xwe hember Kurdistan û érişkîrina ser gelê kurd dide diyar kîrin ku naxwaze serê li bakûre Kurdistanê û dawî be. Li aliye din de ji gelek eşkereye ku çeteyâ Ergenekon yek ji bingehîn héz e ku serê qirêş a li bakûre Kurdistanê li dijî kurdan dimeşin e ye. AKP çawa ku di bûyera Semzînan û kuştina Hirant Dînk de bûyera bi temami deşifre nekir û çavkaniya sûcîdar dernexîst holê wê di mijara Ergenekon de ji bi ixtimaleke mezin wisa be. AKP li aliyeke piştigiriye dide şerê qirêş a li Kurdistanê li aliyeke din ji hawara demokrasiyê dike. Ergenekon encameke şerê li dijî Kurdan e

Piştî darbeya 12'ê İlône nakokiyen

Tîrkiyeyê rû guhertin. Ergenekon ji li gorî van nakokiyen angò li gorî pêdiviyen dewletê xwe bi navê cur bi cur nixumand. Bû TîT, JİTEM, Vatansever Subaylar, Kuvayî Millîye û hwd. Ekiba Cem Ersever hate tasfiyekirin, cihê wê ya Mehmet Agar-İbrahim Şahîn hate ser kar, qezaya Susurlukê ew bi tevi Abdullah Çatlı têk birin. Piştî wan ji Ergenekonê xwe bi Atabayen, bi Kuvayî Millîye, bi generalen teqawit li ser kar girt, ji ber Ergenekon damareke esli ya veşartî ya dewlet û artêşê bû. Her çiqas çapemeniya tîrk çete bi navê "réxistîna terorê" ilan kîr û general û payebilindên dewletê yê berê hatin girtin ji, ji ber vê yekê ye, ji bini ve tasfiyekirina Ergenekon xeyal e. Hikûmet, dewlet û artêş adaptosyonâ wê li gorî şertîn rojane pêk tinin. Ji bo ku çete ji bini ve têk biç, divê iradeyele geleki xurt hebe. AKP li wan hêzân bo berjewendiyen xwe ketin qirika hev û din. Arteşa Tîrk û çeteyen han hevparin bi hev re ne Ji avabûna heta iro dewleta Tîrk di eslê xwe de dewletteke militariste ku hemû bingehîn wan ser derew, tîr û tehdîtan hatiye avakirin. Ji ber vê bingehîn pûc girseya kemalist û xwedi berjewendî û derdorêne birêvebiriya veşartî ditîrsin ku bi guherandina perçeyek biçûk ya derewen ku bingehîn komara Tîrk e wê bibe sedema têkçûna hemû derewan û hilweşîna vê komarê. Arteşa faşist-kemalist a Tîrkan bo parastina vê pergâlê gelek caran bi derbeyen vekiri an ji veşartî midaxaleyi demokrasiyê kîrin.

Dewleta Tirk çareseriya pirsgirêka Kurd ji bo berjewendiyê xwe anî rojevê

Serhad B.RENAS

Dewleta Tirk çareseriya pirsgirêka Kurd ji bo berjewendiyê xwe anî rojevê
Niqaşen li ser çareseriya pirsgirêka kurd ku bi gotinê Ebdullah gul gur bû didiome. Dewleta Tirk 80 sale bi zext û zorê nedîti hewl da ku hebûna kurdan ji holê rake di encama têkoşina rizyariyê a milletê Kurd de êdi neçar ma ku hebûna milletê kurd qebûl bike. Lé dewleta Tirk ser bingeha tune kirina Kurdan hatîye avakirin di demên dai de jî ji çareseriya pirsgirêka Kurd li benda qezencen stratejik e. Hikumeta AKP piştî hilbijartinan bi tundi êrişî ser dekêt û saziyên Kurdan kir. Piştî bi riya Ebdullah Gul "çareseriye" anî rojevê.
Lé piştî baş dekêt holê ku "çareseriya" wan girtin, lêdan, ceza dana zarokên Kurd, qedexeya zimanê Kurdi, girtina DTP û êrişî ser medyaya Kurdi heri dawi jî ya ser Roj Tvye.
Daxwazên neteweyi a kurdan hé jî wek "cûdaxwazi" yê tê nirxandin. Li gor dewleta Tirk çareseri ji çek danina PKK derbas dibe.

Lé dewleta Tirk tu rê û nexše û planê piştî çekberdana PKK eşkere nekiriye.

Ango Kurd dev ji çek berdin dê beramberi vê yekê de cî bi dest bixin ne diyar e. Ji bo çareseriya pirsgirêka kurd modeleke çawa tê fikirin ne diyar e. Tenê behsa çend gavén "çandi" tê kirin.

Dewleta Tirk ku di çareser kirina pirsgirêka Kurd de bi avayekî dûrû tevdigere û piştî gavên baş her tim gavên êrişkirinê ser kurdan davêje

Weki minak ger dewleta Tirk di çareseriye de samimi be divê pêsi zimanê Kurdi serbest bike. Serbet kirina zimanê Kurdi bi TRT6 nabe. Ger dewleta Tirk di meseleya Kurdi de ji dil be...

Heger dewleta Tirk serbest kirina zimanê Kurdi de ji dil be û berjewendiyâ Kurdan difikire û naxwaze zimanê kurd lawaz be divê berê wan gavan bavêje;

1- Navê gund, navçe, bajar û cihen Kurdan paşve vegevine Kurdi.
2-Di fermiyetê de (şaredari, dibistan, zanineh, nexwexane, daireyên fermi) zimanê Kurdi bi her avahî were bikaranin.

3-Dev ji ceza dayin û qedexe kirina rojname, pirtük, malper, kovar, radyo û televizyonê Kurdan berde.

4-Bi temamî qedexeyê ser kurdi di mitingan, afişan û propagandayêni siyasi de were rakirin.

5-Ne di TRT de bila mafê weşana bê sinor bi zimanê Kurdi di tv yêntaybet de were dayin.

6-Bila beşen Kurdolojiyê di zaninehan de were vekirin.

7-Perwerdeya bi zimanê kurdi (di seri de heri kêm yê destpêkê û dersen bijare) were serbest dayin.

8-Li Tirkîye zimanê Kurdi wek zimanê fermi heri kêm di asta bakûrê kurdistanê de were pejirandin.

Ger dewleta tirk heri kêm wan xalan bi cih neyine kanala Kurdi ya TRT dê ji xapandin û zedetri xistina Kurdan kontrola dewleta Tirk zedetir wateya wênebe.

Hesaba dewleta Tirk heye
Dewleta Tirk bi uesti derbarê çareseriye de gavan naveje û tenê ré li niqaşan vedike û her çiqas Ebdullah Gul "ji bo çareseriye" divê ecele bê kirin" gotibe ji tu nişaneye ecele kirinê a dewleta Tirk nine.

Berovaji vê yekê hé ji diji parlementerên Kurdan doz tê vekirin hé ji ehmber bikaranina zimanê Kurdi ceza dibarin.

Cavderen siyasi diyar dikin

ku li piştî hêdi bûna hikumeta AKP de hesabê berjewendiyê hene. Li gor çavderen siyasi dewleta Tirk heta ku deskeftiyen

Her çiqas dewleta Tirk di çareser kirina pirsgirêka kurd de hin agav davêje be ji dewleta Tirk naxwaze kurd pêşkevin û li gor Tirkan divê Kurd neyêne tune kirin ji divê bene kontrol kirin.

Disa eger Kurd dixwazin mafen neteweyi bi dest bixin di vê pêvajoye de divê giraniyê bidin diplomasi û xebatén siyasi û girseyi.

Di vê niqteyê de ji berpirsyari dikeve milê hemû rexin, sazi û dezgehen Kurdan.

Ev rewş kêm zede bo hemû perçeyen Kurdistanê eyniye. Her wiha li ser vê axa Kurd bi hezran sal dijin û di wan

serhadrenas@yahoo.com

Hilbijartineke dîrokî

ZINARÊ XAMO

Li seranserê İraq û Kurdistanê bi milyonan hilbijîr iro cûn ser sindoqan û ji bo pêşeroja welatê xwe dengen xwe dan. Li gor raporên çavdérén hilbijartinan him li İraqê û him jî li Kurdistanê rîjeya besdariyê gelki bilind e. Ez hévi dikim ku bi rasti ji rîjeya hilbijartinê bilind be û bi taybeti ji li Kurdistanê. Lé li gel vê ji, di hevpey vîna bi hilbijîrân ra diyar dibû ku li Hewlêre, Dihokê, Çemçemalê, Kerkûkê gelek kesi nikanibûye dengê xwe bide. Hin nûcêgihanen qala 10 hezaran hilbijîr dikirin. Hin kes kartên wan yêng dengdanê di desten wan da bûn, lê digotin navên wan di listeyen dengdanê da tunene û loma jî nikanin dengen xwe bidin. İcar hejmara vê yekê ci ye ez nizanim, lê meriv hévi dike ku ne hejmareke pir zede be û kurd ji bo vê yekê piştî hilbijartinan bi hev nekevin. Wek dihat texmîkinir, hêzên terorist destê sibê li çend ciyan bombe teqandin û di neticeya van teqinan da bi kemanî 40 kes hatin kuştin û li dora 100 kesi ji birindar bûn. Lé li gor beyana berpirsiyerekî pûlisê Bexdayê, van êrişan tesireke ekse tirsî li gel kiriye û gel bi cesaret û ezmeye hîn mezintir çûye ser sindoqan û dengê xwe daye. Li İraqê û Kurdistanê 19 milyon û li dervayı welêt ji milyonek û 900 hezar hilbijîr besdari hilbijartinan dîbin. Di hilbijartinan da ji 6 hezar namezeti bêtir ji bo 325 kursiyen parlamentojê micadelê didin. Li gor beyanen berpirsiyaren hilbijartinan, pêncsed (500) çavdérén navnetewi, 70 çavdérén Yekitiya Ereban, 250 hezar çavdérén İraqî û 100 ji çavdérén Yekitiya Ewrûpayê li İraq û Kurdistanê çavdêriya hilbijartinan kirin.

Beyî van çavdérén resmi, ji gelek walatan ji li dora 800 rojnamevî hilbijartın şopandin. Serokkomarê Iraqê Celal Talebani, di dema ku li Dibistana Rewşen Bedirxan ya Silêmaniyê dengê xwe da, daxuyaniyek da û got, di avabûna hikûmeta nû ya Iraqê de ewê hin hêzén nû derkevin. Li gor Talebani, hilbijartina vê carê ewê nexşeya siyasi ya Iraqê bi temami biguhere. Li ser pîrsen rojnamevanan yêng derbarê namezetiya wi ya serokkomariyê da ji Talebani wiha got: "Ji bo berendamiya serokkomariya Iraqê ez berendamê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzani me. Şansê gurûbên biçük li himberi min pir kêm e." Talebani, di derbarê listeyen Goran da ji texmina xwe wiha anîye zîmîn: "Goran dixwaze YNK-ê di van hilbijartinan da li Kurdistanê bike hêza sêyem, lê li gor min Lista Goran encaz dikane 3 kursiyen bi dest xe. Û li Parlamentojê Bexdayê ji kurdê bibin xwedîyê 60 kursiyen." Ez hévi dikim ku texmina Talebani rast be û bi rasti ji kurd bikanîn 60 parlamente birşinin Parlamentojê Bexdayê. Dema kurd hejmara parlamente rast be û bi rasti ji kurd yek ewê rol û hêza kurdan ji zedetir û xurttir bike. Ji bo kurdan neticceya heri bas ew e ku kurd wek nuha bibin hêza "kilit, bêyi kurdan kes nikanibe hukûmetê ava bike. Ji ber ku heta ku ereb muhtaci tifaqa kurdan bin ewê nikanibin bajon ser wan û bîryarên gavén li diji wan bavêjin. Lé roja ku herdu seri (sunni û şii) li hev bikin û hewcedariya wan bi tifaqa bi kurdan ra nemine dikane zirarê bidin kurdan. Netice di her halûkari da ji hilbijartinan xurtderketina kurdan him li cihanê û him jî li İraqê rewşa kurdan ewê xurttir bike. Li Kurdistanê Federe, azadi û pêşeroja kurdan hin tam neketiye bin garantiyê, rewş dikane hertim biguhere. Bi taybeti ji di vi wari da şela Amerikayê gelki giring e. Gelo Amerika heta kinga ewê li İraqê bimîne û alikariya kurdan bike? Garantiya vê yekê ne di destê kurdan da ye... Minxabin hin ji miletê kurd ji bo azadî û serbestiye xwe bi heftûheft diwêlan ra şer dikin, tirk, faris û erb ji bo ku kurdan bifetisînin hin ji di keminê da ne. Kurd ne bi erebén İraqê ra tenê, bi Sûriyê, Iranê û Tirkîye ra ji di nava şereki bêdeng da ne, van hersê dewleten zalim ji bo têkbirina Kurdistanê Federe hin ji li pey fersendekê ne. Lé pêşketin wisa nişan didin ku karwanê serxwebûna kurdan carê ketiye rê, li wan bibe şili û şepeli ji, bibe berf û baran ji, bibe bahoz, tozan û bager ji zû dereng miheqeq ewê bigihîjin hedefa xwe, welatê xwe rizgar bikin...

Hebûn an jî tunebûn

FAHRÎ KARAKOYUNLU

(Ziman û Peyman)

"Tekoşin û serhildana her gelî, bi serhildana çandi destpêdike" (CABRAL)

Wek tê zanin, ziman; ne tenê di nabeyna mirovan û civatê de navgina ragîhandinê ye. Ziman, ifade kirina çanda civatê ya bi tevayi ye. Hingî zarok di hemla diya xwe da ye, gelek taybetmendiya ji dayika xwe digre û yê di nav van taybetmendiyan de yek ji; jê dengin. Ev dengana, gava zarok té dinê û bi zimanê dayika xwe diaxife, dibe bingeha zimanê zikmaki. Disa zarok, hewcedariyên xwe yê heri hêsa bi van dengana tine ziman. Ewili, bi diya xwe re, dûre ji bi derdora xwe re, bi vi zimanî dikeve têkiliyê. Ji ber wi, ziman, bi taybetmendiyan din yê çandi re, xwe bi kesayetiya wi zaroki re dike taybetmendiya heri giring. Tê zanin ku, kesek zimaneki din çikas baş hinbîji, ji aliyê kesayetiya mirov, zimanê dû re hinbûyi, wek zimanê zikmaki bandora xwe nikane li ser mirovan bike. Wek disa tê zanin ku, ziman, ji bo civatek etniki hêmana esasi ye. Gava mirov, ji nav civakê ziman raka, ji aliyê taybetmendiya etnisiyê tişteki zede namine. Ziman ji bo etnisiyê wek neynikekê ye, civak xwe di ziman de dibine û nasdike. 21ê Sibatê wek "Roja Zimanê Zikmaki ya Cihanê" çima te pirozkirin: 21ê Sibatê wek "Roja Zimanê Zikmaki ya Cihanê" ji aliyê UNESCOyê, di 17.11.1999 de hatîye ilankirin û ji sala 2000 i vir de ji, té pirozkirin. Saziya Perwerdehiyi, Zanisti û Çandi ya Neteweyen Yekbûyi (UNESCO), tekosina gelê Bengaladeshiya ya di roja 21 Sibatê sala 1952an de ji bo zimanê zikmaki dabûn, wek sembolek (nişanîyek) qebûl kir û ev roja wek "Roja Zimanê Zikmaki ya Cihanê" ragihand.

Gelê Bengaladeshi û bi taybeti xwendevanen Bengaladeshi, ji bo zimanê Bengali, li ber zimanê Pakistani-Ürdi bibe zimanê fermi, xwepêşandane girseyi li darxistin. Di vê çalekiyê de, 11 xwepêşandêr ji aliyên polisan ve hate kuştin. Ev daxwaziya gelê Bengaladeshi, her berdewam kir û Dewleta Pakistani neçar ma û di 1956 de zimanê Bengali ji, wek zimanê Ürdi kir zimanê fermi. (Bengladesh 1971 di bin dagirkeriya Pakistanê de bû UNESCO, bi ilankirina vê rojê re, dixwaze balbikşine ser zimanê di xeterê

de û zimanê li ber windabûyinê de ne. Ji bo vi ji, bi pêşengiya NY û UNESCO ye gelek peyman, agadari û pêşgiri hatine girtin. Di van peyman, agadari, û pêşgiriyan de, bang li dewleta tê kirin û ji wan, di derbarê keshyên ziman û çandan de çareseri tê xwastin. Her çiqas hinek agahiyen ne misoger be ji, li gor raporta Ethnologueyê (Atlasa UNESCO yê ye) ya heri dawi; heta nûha, li rûyê cihanê hijmara zimanen hatîye peyitandin (tespitkirin) 6912 ye. Li gor zimanen Avustraliyayi Christopher Moseley 2511 ziman di bin xeteruya windabûyinê de ye. Li gor raporta Ethnologueyê, 96 ji sedi nifusa (serjimîr) cihanen 320 zimanen bikartine. 4 ji sedi nifusa cihanen ji, zimanen mayî bikartinin. Disa li gor vê rapporte, zimanen di bin xeteruya tunebûn de ne, wek "ji birindarbûna sivik bigre heta mirin" bi penc asta hatîye tespit kirin. 607 ziman wek birindariya sivik di pêvajoyek hessas de, 632 ziman wek birindarê di asta nexweşanayê de, 502 ziman di xeterê cidi de û 538 ziman ji, li ber lêxweytikirina zede, di asta xetererek wehim de ne. 220 ziman ji, di van 60-70 salen dawin de mirin e.

(www.ethnologue.com- www.unesco.org/culture) Raporta UNESCOyê, zimanen di bin xeterê de ne, bi awaki din disenifine (tasnif dike). Gor vê senifandinê, zimanen di gruba "hessas de an li ber xeterê" de ne, tenê di nav malbatan li malan de bi zarokan re té axaftin. Zimanen di "bin xeterê" de ne, édi li malan bi zarokan re wek zimanen zikmaki nayê axaftin. Zimanen di "bin xetera ciddi" de ne, tenê kal û pir dizanin û diaxifin, zarokan wan bes fêm diken lê neviyên wan, tu fêmnakin. Zimanen di bin "xetererek wehim" de ne ji, tenê kal û pir dizanin û karin biaxfin.

Gerinendeyê (Midûr) UNESCOyê Koichiro Matsaura wiha dibêje: "Bi mirina zimaneki, gelek berhemên mirovahiyê yê çandi ya ne maddi (razber) ji winda dibe. Bi taybeti; helbest, destan, gotinê pêşyan û henek ji, bi ziman re winda dibin û vana ji bo civatekê, mirat û kevneşopiyen devokine. Zimanen minda dibin, di derbarê gerdûnê de zinanen resen ji bi xwe re dibin." Giringiya vê rojê, ji bo jiyana nirxen mirovahiyê bi taybeti zimanen zikmaki ne. Lé mixabin li rûyê cihanê, bi navê zordestiyê û nijatperestiyê ji bo zimanen hindikahiya û çandên cûda rézgirtin û tolerans neme ye. Ev nêhirtina û sedemên weki din, ji rûyê gerdûnê, ji nixren cihanê her roj hinek tiştan kêm dike. Gava ku mirov bi zanebûn û vicdan li mijarê binêre; ya dimire û dihere, perçeyek ji her civakê, ji her kesi ye. Li ser ziman û çand, helwesta Dewleta Tirk ci bû û çi ye?

Wek tê zanin, proja Komara Dewleta Tirkîye, projek dewletek netewi bû. Gor damezrêner komarê, li Tirkîye tenê netewek he bû û ew ji navê xwe Tirk, zimanê xwe Tirk, ola xwe İslâm û mezheba xwe ji Sunî bû. Lé ev ne rastiya Enadolê bû. Rastiya Enadolê di her demê de pirzimanî, piroli û pirçanditî bû ye.

Felsefeya damezrandina komara Tirk, li ser red û inkaré hatîye sazikirin. Ev politika bi hinek guhertinê vê dema dawiyê hin ji berdewam e. Ev felsefa di makezagónê de bi zindî xwe nişan dide.

Makezagón xal 3: Dewleta Tirkîye, bi welat û netewa xwe tevahiyek e û né dabeşkirin.

xal 66: Kesén ku bi pêwendîya hemwelatibûyinê bi dewleta Tirk ve girêdayine, Tirk in.

xal 42/1: Tu kes, ji mafê perwerdehiyê û hinkirinê netê mahrûm kirin.

42/9: Zi xeyni zimanê Tirk, tu ziman ji bo hemwelatiyên Tirk di saziyên perwerdehiyê û hinkariyê de, bi navê zimanê zikmaki netê xwend kirin û hinkirin. Hukmén peymanen navnetewi veşartine Li gor makezagóna dewleta Tirk, kesén ku hemwelatiyên Tirkîye ne, Tirkin Gor makezagónê, Kurd û kesén hemwelatiyên Tirkîye ne ji, Tirkin in.

Gava ku herkes Tirk in wê demê zimanê zikmaki yên hemwelatiyên Tirkîye ji Tirk ye, û bê Tirk ji tu ziman bi navê zimanê zikmaki li saziyên perwerdehiyê né te netê xwend kirin û hinkirin. Gava ku mirov li peymanen navnetewi, bi taybeti yên li ser ziman û çand dînihîrin, di hiqûqa navnetewi ya mafen mirovan de, sazikirina mafen çand û ziman, geleki di pêş de ye.

Jiyanâ zimanê Kurdi, hebûn an tunebûna gelê Kurd e. Heta ku ev mafê rewa bîdestkeve, gere, Kurd li her li deverê welat û cihanê di nav tekoşin de be û vala nesekine. Ji bo vi ji gere her malek bibe dibistanek û her kurdek ji bi be mamostayek. Em birnekin ku xeleka siyasetê ya heri qels ev e.

Şili bi saya plansaziyê kêm qûrbanî da

AMED (Pêşketin) : Şili bi pêçnadina brinên xwe hewl dide.

Serok komarê Şiliyê ragihand ku hejmara kesen ji ber erdheja 8.8 Richter û Tsunamiya ji ber wêjiyana xwe ji dest dane gihêste 1023 kesan.

Michele Bachalt her wiha got: muhtemel e ku hejmara goriyan jorda here ji ber ku gelek kes hela bê ser ú şûn in..

Bi taybet li bajarê Concepcion ê, ku hejmara gelhe 670 hezar kesin, li vir bajar hilwesaya,

gelê vî bajari li kolona radibin-rudinin, radikevin. Her wiha pêdiviya xwarin û vexwarinê ji li vir bêtire. Lî beramberi şideta mezin a erdhêja ev hejmara miriyan gellek kêm e.

Pispor diyar dîkin ku sedema vê yekê plansizya baş a di warê bajarvaniya Şili ye. Ger erdhêjek wisa di welateke Tirkîye çêbe dikare bi sed hezaran mirov jiyana xwe ji dest bidin.

HAWAR NET.com



KURTE NÜÇEYÊN NAVNETEWEYÎ

Amerîka hewl dide ku Çînê bi fuzeyan dorpêç bike

Li gorî pisporêñ leşkeri yén DYA û Çinê, DYA Çinê bi mertalêñ fuzeyan dorpêç dike. Heman tişt berê ji ji aliye başûrê Ewropayê ve li diji Rûsyayê hatibû kirin, lê ji ber bertekan paşve hatibû kişandin

Leşkerêñ Amérîkî ji bo demekî ne dîyar dikarin li Haftiyê bimînin

Baylozé Amérîkayê li Haiti Kenneth Merten tekez kir, ku Leşkerêñ Amérîkî ji bo demekî ne dîyar dikarin li vê giravê Karîbê biminin. Agahiya han ji aliya ajansa RIA novosti hatiye belav kirin.

Di navbera Îngîlîstan û Arjantînê de krîza 'Falkland'

Britanya di 60 km. dûri giravêñ Falklandê dest bi kolandina birên petrolê kir. Ser vê yekê Arjantinê bi avayeki tun rêvebiriya Britanyayê hişyar kir û daxwaza vekişandina wan kir. Tê diyar kirin ku ji ber krîzê her dû welat dê biçin Neteweyêن Yekbûyi. erbarê mijarê de welatên Latin Emerika ji piştgiriya Arjantinê dîkin. Giravêñ Falklandê demeke dirêje di navbera Îngiltere û Arjantinê dibe pirsgirêk.

Gelo li Qefqesan şereke mezin nêzik dibe?

Wezirê Parastinê ya Ezerbeycanê Abiyev diyar kir ku ger Ermeni ji Qerebaxê venekêşin dê di demeke nêzik de şerek mezin biqwime. Tê diyar kirin ev gotina Abiyev derbarê mijara Qerebaxê de tehdita heri mezin a salên dawî ye. Di daxûyaniya wezareta paratinê ya Ezerbeycanê de té gotin ku "Edî sebra me nema, em nikarin 15 salên din bisekinin edî dema ordiye hatiye, li Qefqasyaya başûr dibe ku şerekî pir mezin biqwime".

Koreya Bakûr Artêşa xwe derbasî rewşa alarmê kirin

Koreya Bakûr ji ber manevraya leşkeri ya hevbes di navbera Emîrika û Koreya Başûr da Artêşa xwe derbasî rewşa alarmê kirin. Tê ragihandin, ku 38 hezar leşker besdari manevrayan dibin. Li gor nérina Pxényan manevreyen han, pêşrewe dagirkirina Koreya Bakûr in. Ji Fermandariya Artêşa Koreya Bakûr ragihandin, ku manevre bi şewazeke erişkar tê li dar xistin ú lewma ji Pxényan edî pêgiri peymana aştiya bi Seûlê re nine. JI BO ZEDETIR NÜÇEYÊN NAVNETEWEYÎ hawarnet.com

Vatîkan bi skandala seksa gay dihêje



Navenda cihana Katolîkî Vatîkan bi skandala seksa gay dihêje Derket holê ku oldareke Nijeryayı ku di ayinê Vatikanê de ji Papa 16'min Benedikê re alikariyê ji dike fahîşeya gay firotiye. Ghinedu Ehiem'a 40 sali di dema bazariya fehişeyê dîkir axaftinê ji aliye polisan ve hate tespit kirin. Her wiha derket holê ku Ehiem gellek caran derbarê fehişeyen gay de bi Angelo Balducci re ji axifiye. Ev skandal niha Vatikanê dihêjine û di rojeva de mijara yekem e. Ji aliye Vatikavê ve hê daxûyaniyeke fermi nehatiye dayin.. HAWAR NET.com

Îsraîl dixwaze hevdîtinê aştiyê ji nû ve destpêbikin



QUDÛS: Îsraîl dixwaze awayeke bi lez bi Filistinîyan ra pêvajoya guftûgoyen aştiyê nûjen bike. Derbarê wê yekê da, serokwezirê Îsraîlê Binyamin Natenyahû bi telefone ji serokkomarê Misirê Husni Mubarek ra ragihand. Mubarek ji, jê daxwaz kir, ku dest ji avakirina xaniyan li deravên rojava çemê Úrdinê û dorpêçana Xezzayê berdin. Guftûgoyen aştiyê di navbera Îsraîl û Filistinê da, di sala 2008' an dema Îsraîlê dest bi operasyona li ser Xezzayê kir hatibûne birin. Serokê Filistinê Mahmûd Ebbas iro di liga dewletên Ereb da, nûjenkirina diyaloga bi Îsraîlê ra gotûbêj dike. HAWAR NET.com

HAWAR NET
 kurdistan amed duhok
 zanyari zaxo sine agiri xaneqin
 mardin batman hewler
 cizir erkeni sirin wan colêmerg mehebad riha
 sêri simex idir qamiso
 silêmani nûce kerkük
 aktuel brikael paris tehran bûyer teknoloji
 çand zanist ziman huner
 rojev medya şîrove

zanîn xwe nasîn e...

HAWAR NET
hawarnet.com

Nijeryayê pevçûna dînî; 200 kuştî

Li Nijeryayê ji nû ve
şerê nevxweyî
bilind dibe

(Pêşketin): Li Nijerya, li gor agahiyan di
pevçûneke bajaré Jos ya kësebar de, heri
kêm 200 gündiyen Kristiyan hatine kuştin.
Rûniştiyên gündê Dogo Nahawa yê başûra
Jos dibêjin, erişbirên Misilman roja Yekşemê
danê sibede avétin ser gundê wan. Gundi
dibêjin, erişbir gule barandin ser gel ku, ji
malen xwe derkevin û bi kér û satoran erîsi
wan kirin. Gundi dibêjkin, erîşkêr
Fulaniyên Misilman in û jibo tolhildanê
eeriş wan kirine.
Sedema wê erîşê, heta niha naye zanin lê
hinek rojnamevan dibêjin ihtimal e ew
qirkirin jiber sedemen oli be. HAWAR NET.com



Kîjan welat ji bo fûtbolê
şer kiri bû?

Welatê Hondûras mafê tevlî bûna
qûpa Cihanê ya îsalê bi dest xist

Honduras weliteke Emerikaya navin e û
welatek feqir e. Havinabihûrî rîvebirirî ket
destê leşkeran. Honduras mafê tevlî bûna
qûpa Cihanê ya îsalê bi dest xist.
Cara pêsi Honduras di sala 1969'an de
baeşdari Qûpaya Cihanê bû. Di qûpâyê pişti
maça El Salvador û Hondûrasê navbera
aligirên her dû timan de pevçûn derket.
Pevçûna aligaran bû sedema destpêbûna şer
a di navbera El Salvador û Hondûrasê de.
Elbet di navbera her dû welatan de
pirşirêkên din ji hebûn lê li cihanê cara pêsi
bi pevçûna futbolê şerek destpêkir. Honduras
erîsi El-Salvadorê kir. Ev bûyer wek Şerê
futbolê hate binav kirin.

Cihan bênavber dihêje; Li Teywanê jî erdhêj

Piştî Haiti û Şiliyê iro Tayvan jî bi tundiya 6,4 hejiya

(Pêşketin): Erdhejeke giran iro başûra Taylandayê hejand û di encamê de elektrîk qut bû û li
beşa tranzitê ji tevlihevi çêbû. Li gor raporta AFP, di encama erdheja bi giraniya 6,4 ku iro
Tayland hejand heri kêm 8 kes birindar bûn, lê zirarek wisa li navcê neketiye.
Wezareta parastinê a Taylandê ji ragihand ku 10 helekokter ji bo hilkolandina rewşa navcê û
texmina zîraran şandine navcê.

Her wiha, Navenda Lekolinê Jeolojik a Amerikayê (USGS), destnişan kir ku li Şiliya ku erdheja
8.8 lêda, iro bi saeta Iraqê 02:59'ê û bi saeta Tirkîyeyê 03:59'ê erdhejek bi tundiya 6,1 hatiye
tespitkirin. Hate zanin ku navenda vê erdhejê 39 kilometre rojavayê herêma Valparaiso 34
kilometre binerdê bûye. Nehat diyarkirin ka tu ziyana mal û canî çêbûye an na.. HAWAR NET.com

Brown; Dagir kirina Iraqê biryareke rast bû

Serokwezîrê Brîtanya Brown, got ew biryarbiryareke di
cîyê xwe de bû

(Pêşketin): Serowezir Brown, dema destpê kirina şerê Iraqê, Wezirê Xezine yê Britanya bû. Ew roja
îniyê, destbi dayina ifadeya xwe ya derbarê şerê Iraqê kir. Gordon Brown, weki wezirê xezinayê
biryara xercen li ser berevaniyê dabû. Ew rû bi rûyê rexneyen giran dimine, ku hézén çek û alavên
Britani li Iraqê ne rek û pék bûn û wi li hember malbatén behidar yén leşkeren Britani ji elâqeyeke
germ nişan nedaye. Birêz Brown ani zimên ku hemi xerc û mesrefen şerî cîyê xwe de bûn. Li meha
1'ê isal, Serokwezir berê yê Britanya Tony Blair ji, bersiva pirsên heman lepirsinê dabû û gotibû, tu
poşmâniya wi li ser biryara şerê tune ye..

Jİ BO ZEDETIR NÜÇEYÊN NAVNETWEYİ hawarnet.com

KURTE NÜÇEYÊN JI CÎHANA ABORIYÊ



Li Yûnanîstanê kaos didome

Xwepêşanderan li Atina paytexta Yûnanîstanê li diji këmkirina müçeyen fermanberan
û herwisa zêdekirina bacê li ser hevwelatiyên Yonanî baregehê wezareta darayıya
Yûnanîstanê dagir kirin. Wezareta Aboriyê ya Elmanyayê daxûyand ku Elmanyaa dê
ji Yûnistanê re get pere nede.

Dizayna dolarê ya nû 21'ê Nîsanê aşkere dibe

Dizayna nû ya 100 dolar banknoten DYA'yê, li Daireya Pere ya beşa Gencîneyê ya
Wezareta Darayı ya Dewleten Yekbûyi yên Amerikayê dê 21'ê Nîsanê bi merasimekê
bête nişandayin.

Sekreterê Giştî yê NY oz da, ku jibo Şîliyê 10 milyon dolaran alîkarîyê bikin

Sekreterê Giştî yê NY Pan Gi Mûn soz da, ku jibo Şîliyê 10 milyon dolaran alîkarîyê
bikin. Di meha Sibatê da Şîli jiber erdhêj û tsûnamiyê zîyanê ketibû. Pan Gi Mûn
serdana Şîliyê kir, ku encamên erdhêjê binirxîne.

Di 10 salên dawî de jinê bêkar bûn du qat

Li Tirkîyeyê di sala 1999 de radeya tevlibûna jinan a karê di sala 2009 de ket ji sedî
26'ê û hejmara jinê bêkar jî bû du qat.

**DI KURDO de
her tîst li ber
destê te ye...**

**Ename, sohbet, lîstik
nûçe, video, kêf, agahî
û zêdetir...**



Zanist û Teknolojî

Bi pîr bûnê îxtîyaca xewê kêm nabe...

AMED (Pêşketin)

Divê mirov di 35 saliya xwe de çiqas radikeve divê di pîr bûna xwe de ji ewqas rakeve. Hate niha wisa dihat zanin ku bi pîr bûnê pêwistiya bi xewê ji këmtir dibe. Lî li gor lêkolineke zanîngeha California yê derket holê ku di rasti de pir ji bi qasê ciwanan divê rakevin. Li gor encama lêkolinê îxtiyaxa piran ji bi qasê ciwanan bi xewê heye û kêm rarzan ji di piran de dibe sedema kêm bûna hişê. Serokê lêkolinê Prof. Drummond diyar dike ku divê

mirov di 35 saliya xwe de çiqas radikeve divê di pîr bûna xwe de ji ewqas rakeve. Drummond dibêje "kesen ser 65 sali ji ber ku di sistema jiyana wan de hin guhertinan çedibe nikarin baş razen û ev yek ji dibe fikra "edi pêwistiya min bi qasê berê jî xewê re nemaye". Ev fikreke şâş e. Xewa rojê ji pir başê Her wiha li gor lêkolineke din ji xewa nivro ji bo xûrt bûna hişê gellek baş e.

HAWAR NET.com



D.Bekîr di 3G de yekemîn e

Herî zêde gelê Amedê 3G'ye eciband.

Li gor daneyen şirketa Turkcell ku ku nû hate weşandin supriseke balkeş derket holê.

Li gor agahiyen ku Turkcell eşkere kiriye li Tirkîyeyê heri zêde axaftina bi dimen a bi riya 3G'ye li navçeya navendi ya Diyarbekirê navçeya Sûrê pêk hatiye

Ev istatistikên dawi nişan didin ku heri zêde Kurd pêşketinê teknolojiye diecibinin û zû hin dîbin û bikartinin. HAWAR NET.com

Êşa zirav hê jî li Kurdistanê heye!



AMED (Pêşketin): Girtineke elektronmikroskobik a bakteriyen tuberkulozê pêk tînin Cihén ku tuberkuloz lê pirr in, nexweşiyeka gîran, domdar û mikrobik e. Bakteriya ko di sala 1882'ê da Robert Kochî keşkiribû Mycobacterium tuberculosis vé nexweşiyê çedîkit. Li Kurdistanê hin caran ji vé nexweşiyê ra "nexweşîya zirav" ji dîhêt gotin. Heya destpêka sedsala 20'ê weki nexweşiyaka bixeter û canstîn bû û heger sawa vé nexweşiyê biketa herêmekê, bi hezaran mirov dikuştin. Ev nesaxi bi veditina dermanen antibayotik anko dijejik weki her nesaxiyaka di ya hewdanî hat çareserkirin. Heta dehsala 80'an li sedsala 20'ê ev nesaxi li Welatên Werarkiri ber bi neman diçû.



Stres, pirsgirêka mezin a jiyana nûjen e

AMED (Pêşketin): Stres tê wateya "giraniya borandina jîyanê". Di jîyanê de hêz û giraniyaka her tiştî heye. Di kargehê de, di têkiliyên mirovan de, di malbatê de hwd jîyan xwedî tempoyek e.

Ev tempoya han hin caran zora tempoya mirov dibe û mirov xwe di bin giraniyê de hîsdiye. Ev e stres.

Stres herçendî negativ, ewçendî ji pozitiv e. Stres mirov ditikîne ku mirov karê xwe di tempoya jîyanê de bike û biserbîkeve. Her mirovek xwedî toleransek e. Hin kes zû dikevin stresê, hin ji dereng an kêm.

Stres xwedî vizyonen biyologik, psikologik û fizyologik in. Li ser fizyologîya stresê gelek xebat hatine kirin. Dema organizmaya mirov bikeve xetereyekê yan bar giran bibe, organizma dikeve alarmê. Bi her aliye ve berpêyên xwe nişandise. Organizma dixwaze û lêdigere ku seri bi ve rewşa nû re derine, dengeyekê avabike. Helbet organizmaya her mirovek gori taybetiya xwe reaksiyon dide. Heger organizma seri bi ve rewşa nû re derneyne, ango stres zora mirov bibe, ziyan dide. Ziyan xwe bi her ali ve dide der. Hin cureyên simptomên psikosomatik ji ber stresê ne. Herweki stresa mezin ziyanen biyologik, fizyologik û cîvakî didin.

Pispor di wê baweriyê de ne ku, jiyana nûjen û tempoya wê gelek ziyanan dide mirovan. Mirov dikare bêje stres, pirsgirêka mezin a jiyana nûjen e. Lî stres kêm be ji divê hebe ji ber ku stresa kar ú xebatê alikariya serkefti bûnê ji dike.

Êv morî him bilêzin, him jî kûjer in

Zanyaran diyar kirin ku cureke müriyan ku li Emerikaya Navin diji xwedî çençeyekê kûjer e. Tê gotin ku müriyên bi navê xwe yên zanist iOdontomachus bauri di saetekê de di navbera 125-233 kilometreyan de bi lezgîni devê xwe digire.

Zanyaran dimenê müriyên bi navê Odontomachus bauriyê bi video ve kişandin û ser lêkolin kirin. Di encama lêkolinan de hate ditin ku ev müriyên kûjer nêçira xwe bi lez dikuje û nêçir nikare xwe xilas bike. Dirêjahiya müriyên Odontomachus bauri 7 milimetre ye. HAWAR NET.com



Ji bo jîndariya goştên ser neynûkan

Amadekirina losyona neynûkan... Nîv kevçîye şeranî sihik.. Zerdika hêkekê. Kevçîyeke ava ananasê

Malzemeyan baş tev bidin, serê tiliyên xwe nîv saetê di vêlosyomê de bîhelîn. Dê goştê ser neynûkê we jîndar û saxlem bibin.

Jetpack hinek mezin e lê difirîne!

Bandorê Facebook di her qadê de heye. Ji ber torê sosyal ên weki Facebook'ê bi taybeti ciwan ji blogan dûr dikevin. Li gor lêkolinekê li Emerikayê bikaranina blogan (rojniviskên internetê) di nava 3 salan de ji ber Facebook û Mayspace'ê % 50 këmtir bû. Her wiha li gor lêkolinê her çiqas navê Twitter di medyayê de pir derbas dibe ji di nava ciwanan de ne zêde navdar...



Jetpack hinek mezin e lê difirîne!

Xeyalake din a mirovan bû rasti. Motora jetê pêsi a bi navê Jetpack mirov dikare li pistâ xwe hilgire derdikeve bazarê. Hate ragihandin ku di demeke nézik de dest bi hilberina Jetpackê tê kirin. Bo cara ewili dê 500 heb ji Jetpack'ê were çekirin. Li gor agahiyen bûhaya vé amûrê 76 hezar dolar be. Fikra amûreke wisa cara pêşin di salen 1930'i derketibû holê..

Dîzanterî nexweşîyeke çawa ye?

Dîzanterî yek ji nexweşîyên mikrobik û bisaw e. Pirrani ji ajalan derbasi mirov dibe. Mixabin li Kurdistanê gelek zarok ji ber vé nexweşîyê dimirin ku çareseriya wê pirr hêsan e. Tesbitkirina nexweşîyê bêî nirxên laboratuar dijwar e. Bi taybeti testa destava mezin.

Hin nişaneyên dîzanteriyê

Zikêseke dijwar Ishel, Miznegirtin, daxwaza mizê Nebirêkûpêkbûna tîna laş, Du cureyên wê yi sereke hene: Dîzanteriya amîpi, dîzanteriya basili. Tedawiya wê hêsan û pirrani biserketi ye. Divê mirov sedi sed derziya parastinê li zarakan bixe..

weşanên nûçe - rojname - tv - kovar - radyo

Hemû linkên ji medyaya Kurdi.

Cihê we yê destpêkê!

Bixwînin - Zîndî Temaşa û Gühdarî bikin
medyayakurdi.com




Avatar tenê 3 xelat wergirt

AMED (Pêşketin)

Xelatên Oscar'a 82'emin hatin belav kirin. Avatar ku o neh beşê de wek berendam hatibû nişan dayin tenê 3 xelat wergit. Her wiha isal cara pêşî derhênerk jin xelata derhênera heri baş stand. Kathryn Bigelow, bi filma "The Hurt Locker" ê xelata derhênera heri baş girt. Her wiha filma wê "The Hurt Locker" tevi xelata filam heri baş bi giştî 6 xelata Oscarê girt. Listeya xelatên Oscarê ya 2010ê wiha ye: Filmê heri baş: The Hurt Locker Listikvana heri baş: Sandra Bullock (The Blind Side) Listikvanê heri baş: Jeff Bridges (Crazy Heart) Derhênerê heri baş: Kathryn Bigelow (The Hurt Locker) Listikvana ciger a jin a heri baş: Mo'Nique (Precious)

Filmê biyanî yê heri baş: The Secret in Their Eyes (Arjantin) Animasyona heri baş: Up Dokumantera heri baş: The Cove (Louise Psihoyos ve Fisher Stevens) Senaryoya xweser a heri baş: Mark Boal (The Hurt Locker) Senaryoya heri baş ji bo sinemayê hatiye lêrikibandin: (Geoffrey Fletcher (Precious)) Derhênerê dîmena heri baş: Mauro Fiore (Avatar) Muzika filmê heri baş: Michael Giacchino (Up) Strana orjinal a heri baş: The Weary Kind (Crazy Heart) Kostümê heri baş: Sandy Powell (The Young Victoria) Makyaja heri baş: Star Trek Efekta ditbarî ya heri baş: Joe Letteri, Stephen Rosenbaum, Richard Baneham ve Andrew Jones (Avatar) SINEMAKURD



Albûmên heri baş a 10 salêñ dawî ya mûzîka Kurdî (Kurmancî)

10 salêñ dawi de mûzîka Kurdî him ji aliyê naverokê de, him di warê asta qeliteyê de, him jî di warê renginiyiê gellek gûherî. Em ji wek MUZIKKURD.com li gor pîvanêñ wek hejmara firotina albûman, him di warê balkışandinê, him li gor rexneyêñ mûzikzanan û him jî di di warê mayînde bûna albûman de albûmîn heri baş a mûzîka Kurdî a Kurmancî a 10 salêñ dawi bijartin. Albûmîn di listeyê de nayê vê maneyê ku pir serkefti ne. Pivana me ya sereke ne populer bûnê. Em wek pivana sereke qeliteya mûzikê esas girtin ku albûmîn han di mûzîka Kurdî deriyêñ nû vekirine. Sebra Min - (2006) Rojda

Derya (2003) Ciwan Haco	Pola Nû - (2006) Koma Rewşen	Westiya Bû - Xero Abbas
Sêdil (2008) Aramo	Jan-Ar (2006) Rotinda	Nûpel - (2005) Aynur
Jar û Evin (2005) Burhan Berken	Wenda - (2008) Mehmet Atli	Çû - (2004) Dino
Si - (2001) Çar Newa	Xewna Jiyan - (2008) Serhado	Zend - (2004) Xelil Xemgin

Ji ceneta xwe kûjera xwe temaşe dikim



Li bendemayîna cenetema min - The Lovely Bones
Derhêner: Peter Jackson
Listikvan: Mark Wahlberg, Rachel Weisz, Susan Sarandon, Stanley Tucci
Susie di 14 saliya xwe de hatiye kuştin û çûye cenetê. Pişti mirinê jiyana wê ya bêyi wê didome,

şiroveyên li ser windabûna wê, hêviya malbata wê ku hê li bendê de keça wan zindi bê ditin û rewşa qatil ku dixwaze delilan ji holê rake... Film li ser van diçê û tê. Film ji aliyê atmosferê de we digre bin bandora xwe. Lê li gor rexnegiran film li hemberî bendewariyêñ ji Peter Jackson ku Efendiya Gustilkan kişandi bû ne zêde başe. SINEMAKURD

Haldûn Dormen bi "Çirokeke Zivistanê" pirek bo aştiyê ava kir



AMED (Pêşketin): Promeriya muzikalâ "Çirokeke Zivistanê" ya derhêner û şanogerê naskiri Haldun Dormen ji piyan ve bi çepikan hate pêşwazikirin. Promiye riya muzikalâ "Çirokeke Zivistanê" ya ku şanoger Haldun Dormen "bo piştgiriya aştiyê" derxistiye ser sehneyê, duhi, li Şanogeha Bajêr a Şaredariya Diyarbekirê hate pêkanin.

Gelek temâşevan hatin û ligel rojnameger û siyasetmedar bi kelecan lê temâşe kirin. Haldun Dormenê ku di jiyana xwe de yekem listika xwe ya bi kurdî pêşkê kir, hate dîtin gelek bi heyecan bû. Kesêñ kesêñ naskiri li leyizê temâşe kirin. Di şevê de axaftin hatin kirin û girîngiya vê hewldanê hate bibîrxistin.

Berhemeye nû ji Weşanêñ HANê: Nalînêñ Peravan

AMED (Pêşketin): Weşanêñ Han ev car ji bi romaneke tiji û zengin ya nivîskarê kurd Kovan Sindi »Nalînêñ Peravan« ve derdikeve pêşberî xwendevanê xwe. Kovan Sindi di vê berhama xwe de mijaren xwe li gor üslûba realizmeke civakî ristîne û zimaneki gûr û dewlemend bi kar anîye.

Jiyana civakî ya Kurdan, hestêñ binkeftinê û jinûve şiyarbûna kesayetiya binkefti, berxwedan û her wiha eza û tedayiyêñ bê hesab yêñ hêzén dagirkeran û di dawiyê de windayı... Û wek navê xwe peravêñ welateki dinalin...

Ji seri heta dawi bûyer û çirokên trajik û helwesta bê radest ya geleki qedim, gelê Kurd ya li gel vê trajediyê bi ziman û üslûba rastberî ü xemgini ya Kovan Sindi hatiye ristin. Ev sêyemin romana Kovan Sindi ya çapkirî ye. Roman ji ciwar beş û 302 rûpelan pêk dihê.

Nasnameya Pirtûkê:
Nalînêñ Peravan
Nivîskar: Kovan Sindi
© Han-Grafik & Kovan Sindi
Çapa 1.
Berlin/Çille-2010
Weşanêñ Han - 21
Roman- 9

Erdhêj zêde dibin; Gelo bi rastî qiyamet nêzik dibe?

HEWLÉR (Pêşketin): Erdhêja li Hâiti û Tayvanê, li şili û li Kamçatkê bûne sedemê wê yekê, ku li ser nézbûna roja qiyametê tê axaftin. Bûyerên xwezayî her diçe zêdetir diqewimin. Di sedsala 21' an da ew bûyer bûne sedemê mirina bi sedan hezaran mirovan. Li Okyanusa Hindistanê bi tevi tsunamîyê erdhêjek gelek bi héz li Sûmatreyê qewimi. Li Mayami, Karib û Amerikayê tofanên mezin seri hildan. Rûpelên nûcîyan bi lêhi, şewatên

daristanan, heyelan û babiloskan tûje ne. her roj daneyên nû yên derbarê germbûna global têne ragihandin. Di destpêka salê da erdhêja li Hâitiyê cihan xemgin kir, ku paytexta wî welati Porto-Prens ser ú bini bû. Bi wan bûyeran ve girêdayî dest bi pêşbinîyan hate kirin, ku sala 2012' an dawîya jiyanê ye. Salnameya kevnare ya Mayayê ji ji bo pêşbinîyan diken bingeh. Civatên internetê bang li hemû kesan dikan, ku bi këfxweşî pêşvaziya dawîya jiyanê bikin.

IQ'yên cixarekêsan kêmîtir e

Ji Reutersê nûcîyeke balkêş a tenduristiyê... Kesên ku cixare dikşinin IQ'ya wan kêm e.. Li gor nûcîyê lêkolîneke li israile nişan dide ku asta jîriyên cixare dikşinin li gor kesên ku cixare nakşinin 8 puan kêmîtir e.

Li gor lêkolîne; > Kêmzêdeya IQ'yên kesen cixare nakşinin: 101 > Kêmzêdeya IQ'yên kesen cixare dikşinin: 94 > Kêmzêdeya IQ'yên kesen her roj 1-5 cixare dikşinin: 98 > Kêmzêdeya IQ'yên kesen piştî 18 saliya xwe dest bi kişandina cixare kirine: 97 > Kêmzêdeya IQ'yên kesen her roj paketek an ji zêdetir cixare dikşinin: 90 Pîspor pêşniyar dikan ku kesen ku asta IQ'yên wan kêm e di dema dibistanê de bêne tespit kirin û ji ber ku zêdetir meyla wan bo kişandina cixare heye ji bo asteng kirina wan xebat bêne meşandin.



Dîroka nêz a Kurdistanê di meha Adarê

Serhildana Dêrsimê dest pê kir
01 Adar 1936

Mele Mistefa Barzani Çû ser heqiya xwe
01 Adar 1979

Parlementerên DEP'ê hatin girtin
02 Adar 1994

Kovara roja nû dest bi weşanê kir
03 Adar 1943

Dewleta Tirk xwendigeh û komileyên kurdi qedexe kir
03 Adar 1924

Selehaddinê Eyyûbi li Şamewefat kir
04 Adar 1193

Serhildana Koçgiriye dest pê kir
06 Sibat 1993

Serhildana başûrê Kurdistanê Raperin li Ranyayê dest pê kir
07 Adar 1991

Mihemed Şêxo koça dawin kir.
09 Adar 1989

Rejima hov a Iraqê bi gaza kimweyili Helebceyê 5000 Kurd şêhid kir
16 Adar 1988

PKK agirbesta yekemin ilan kir
17 Adar 1993

CEJNA NETWEYÎ YA KURDAN.
21 Adar

Di serhildanên Cizir û Nisêbinê de 93 kes şêhid ket
21 Adar 1993

Li Çinê gûherîna sosyal û zayendî

Dli çinê demen dawi gûherîna civakî bilîzîtir dibe. Bi taybeti di nava ciwanan de çanda gelêriya Çinî kêm dibe û bi bandora rojavayê

vegûherîna zayendi pêk tê.. Li Çinê nêrina hemberî seksê ji digûhere û hikûmeta Çinê azadiya seksê birfireh dike.



Yekem û yekane weşana nûcîyê a Kurdi ya müzika Kurdi
nûcî, albûmén nû, liste, agahi, klip, jiyanname, gotar

EGER TU KURD İ...
Ü TU HAXWAZI BINDEST BİMIN, TU HAXWAZI ZİMANE KURDI Ü MILLETÊ KURD TUNE BİMIN...
BI DAXWAZNAMEYAN, BI MEŞAN, BI BOYKOTAN, BI ÇALAKIYAN, BI NEÇÜNA DIBISTAN Ü KARGEHË, BI DOZ VEKIRİNË...
PERWERDEYA BI KURDİ BIXWAZE!

Jİ BO REKLAM Û ÎLANÊN WE

Hûn dikarin di Pêşketin, HAWAR NET.com an jî weşanên din ên koma HAWAR de reklam û îlanên xwe bi nirxa herî gûncaw biweşînin.

têkîlî agahi@hawarnet.com